Dengvedana navê dewletê di hozana kurdî de



Reşîd Findî

Pêşekî:

Miletê Kurd wekî hemû miletên dinyayê her zû hest bi serxwebûna xwe kiriye û ya pêdivî dîtî, wî jî wekî miletan kiyanekî cuda hebe ji miletên din, û dewleta xwe li cîhanê hebe, da wê hest bi hişyarbûna xwe ya neteweyî bike rastiyek û ketwarek, bêgomane ev hişyarî ye jî berî hemûyan wê li cem rewşenbîrê miletî peyda bibe, lewma her zû wan rewşenbîran ew hizra azad aşkera kiriye û li nav xelkê xwe belav kirine, hozanvanên Kurd, her zû , pêşengiya wan hizr û bîran wergirtiye, çinku berî çend çerxekan, her hozanvan û nivîser, di warê rewşenbîrî de pêşengên miletî bûn, yan bibêjin her hizr û bîr û verêjên wan yên bo me mayîn û gehiştîne me. Ger hindek camêrên berî wan yan jî di gel wan de jî hebin, lê çu paşmayên gomanbirrên wan li cem me peyda nabin.

Hozanvanên Kurdên kilasîk her ji kevin de hizir di rewşa miletê xwe de kirine, bindestî û tepeseriya wî berçav kirine û gelek gengeşe li ser wê arîşeya netweyî kirine, bi kurtî çareserî wisa dîtine, ku hebûna dewleta Kurdî baştirîn çareserî ye bo wê kêşeyê lewma berî çendîn çerxên dîrokî wan helbestvanan bi aşkerayî ev babet e vekolane û gehiştine wê encamê.

Naverok Berî hemûyan helbestvanê Kurd yê mezin Melayê Cizîrî 1567-1640Z ev bi duristî berçav kiriye.Cizîrî bi hemû zelalî hesta wî ya neteweyî digehîne wê encamê ku wî divêt dewletek Kurdî hebe û berî(450) salan heza xwe bo hebûna wê dewletê diyar dike û bajarê Cizîrê wek paytext bo wê dewletê dest nîsan dike û mîrê Cizîrê yê navdar û hevçerxê wî(Mîr şeref) jî wek mîr bo wê dewletê bi baştirîn mîr dideyne, dê bila bo piştrastiyê hinde rêzehelbestên wî wek nemûne dibîne. Da ku hûn yên birêz agehdar bibin:Derbarey bûna Cizîrê wek paytext bo Kurdistanê Cizîrê dibêje: Ma (Cizîrê) şubhê darê textê heft îqlîm bit

Hem bi hikum û seltenet Îskender û Fexfûr bî (1)

Anku wî divêt Cizîr bibe paytextê her heft îqlîman di cîhana wî serdemî de û mîr şeref bi desthilatê bigehe Îskenderê Mekedonî û Fexfûrê melekê Çînê.. herwisa dibêje mîr şeref:

Ê ne(dewletxwahê) hezret bit ji nîva can û dil

şubhetê ahlê şeqa ber qehr û azarê tebî (2)

Anku yê hejêkerê dewleta te nebe ji nîva can û dilan, bila her li ber qehr û azaraê be..

Yan: Mahtaba (dewletê) yek portewek şem a te bit
Aftaba rîfetê, berqek ji anwarê te bî (3)
Ji Estanê dewletê xayîb nebî carek Mela
Da ji fermana mukerem dem bi dem memûr bî (4)
Herwisa Xanî yê mezin jî piştî Cizîrî bi dirêjî helbest li ser wê babetê hûnandine û bîrdozek neteweyî ya rêk û pêk bo dewletbûnê darêtiye û bi aşkerayî li berahiyê dimîne hêbetî, ka çima Kurd heta niha ne bûne dewlet, dibêje:
Ez mame di hikmeta Xwedê de Kirmanc di dewleta dinê de
Aya bi çi wecihî mane mehrûm Bi lcumle ji bo çi bûne mehkûm (5) Lê ew egera dewletnebûna me divegere neyekbûnê, dibêje:
Ger dê hebûya me îtihadek Vêkra bikira me înqiyadek
Rom û Ereb û Ecem temamî Hemiyan ji me re dikir xulamî
Tekmîl dikir dîn û dewlet Tehsîl dikir me îlm û hîkmet (6)
Herwisa hebûna padîşahekê Kurdiyê jêhatî û lêhatî li cem Xanî fer e bo bi rêvebirina wê dewletê, çunkî wî serdemî dewleta hemûyan padîşahên xwe hebûn, dibêje:
Ger dê hebûya me padîşahek Laîq bidiya xwedî kulahek
Hasil bibûya ji bo wî tacek Elbette dibû me jî rewacek
Xalib nedibû li ser me ev Rom Ne dibûne xirabeê di dest bûm (7).
Bêgomane Xanî hizra sikke û pareyan jî kiriye, wek hêmayek bo hebûna wê dewleta Kurdî, dibêje:
Ger dê hebûya me serfirazek Sahib keremek suxen newazek
Neqdê me dibû bi sikke meskûk Ne dima wiha bê rewac û meşkûk
Neqdê me mebêje kêm behaye Bê sikkey şahî şehrewaye
Ger dê bibûwaye bi zerb menqûş Ne dima wiha bê rewac û mexşûş (8).
Lê bo bi cih înana van karan, wî her omêd bi mîrê Kurdan heye ku navê wî Mîrza bû û hevçerxê Xanî bû:
Mîrê ku bi navê Mîrzaye Mehden nezera wî kîmiyaye
Qelbêd di zexel dikit bilûrî Polêd di dexel dikit filûrî
Eilayê dikit bi qehrê edna Ednay dikit bi lutfê eila
Ger dê wî nezer bidame carek Eksîrê teweccuha mubarek
Ev qewl hemû dikirine eşar Ev pûl hemî dibûne dînar (9)
Zanistê kîmiyayê yê berê, ew bû ku pareyên bêxêr yan medenên bêxêr diguherin û dikirine zêr, lewma Xanî gotiye (polîd di dexil dikit filûrî) yan dibêje.. ger wî nezer li me kiriba, da (ev pûl e hemî bibine dînar).
Herwisa ev hizr û bîroke ji cem Xanî bo Hacî Qadirê Koyê 1815-1897Z, hatine veguhaztin û ewî jî pirr behsê dewleta Kurdî kiriye, dibêje:
Beşîr û xame dewlet payedar e Emin xamem heye şîr na diyare (10)
anku Hacî wisa dibîne ku dewlet li ser binaxeyê qelem û şûrî dihê çê kirin, divê hêzek hebe, dijmin bitirsin, da sînorên dewletê bêne parastin, herwisa qelem jî bo bi rêvebirina karê dewletê fer û pêdiviye. Bê van herduwan dewlet nayê danan, pişt re dibêje:

Wezîfey xoy be cê hêna temamî Be şîrî dewlete nîzamî(11).
Ew wisa dibîne ku nîzam û qanûn li nav dewletê divê bihête paraztin, divê şûrê dewletê hebe, da milet nîzamê bibîne….
Paşî yek rêziya miletî û dilsojiya wan bo berdewamiya dewletê fer e, lewma dibêje:
Ewaney milkî xoyan kirde dewlet Weku bot deyperiztin giştî milet(12).
Herwisa li parçehelbestek dî, Hacî azirandina milletî dike û han dide bo rabûnê û hestanê û serhildanê û nemûneyan ji miletên dî rêz dike, dibêje:
Her diwênê ehlî Sodan hestane pê weku şêr Êstake mosteqilîn ma donî kulî edyan Sodan ji sala 1881ê heta sala 1885ê serhildan bi serkirdatiya(Mehdî) kir dijî Înglîzan.
Bulxar û Sirb û Yûnan, hem Ermenî û Qeretax
Her pênciyan be ejmar nabin bi qedî Baban
Serpakî musteqilîn, kolêkî dewletêkin
Xawindî ceyş û rayet, erkanî herib û lêdan (13)

Ew dixwaze wisa diyar bike, ku miletên biçûk, ew ên hingî li bin sîbera dewleta Osmanî, hemûyan serhildan kir û bûne dewlet wekî Bolxar, Sirb,Yûnan û Qeretax.
Herwisa helbestvanekî dî jî li devera Behdînan ew hizir kiriye û bi aşkerayî bi wê şopê de diçe, ew jî helbestvanê navdar(Ahmedê Nalbend), 1890-1963 û fer dibîne ku Kurdan dewlet û hikûmet hebin, dibêje:
Ey bira Kurdê tu nabî hukmetek
Hindî bo xeyrî te maye fursetek
Dê tu jî hukmî bike mehkûm nebe
Ma di gel xelkî we nabît huccetek
Kafir û muimin hema hukmê kirî
Hinde dunya ew tu nabî dewletek
Min eqîda hey bi Kurda bi zîrekî
Min bi hukmê wan yeqîne niyetek
Ehmedî heq got bila kes sil nebît
Bo me jî lazim hebîtin newbetek(14)

Anku Nalbend bi rewşa Kurdan yê hîngê, yê razî nebû, lewma dibêje:
(Dê tu jî hukmî bike mehkûm nebe.). yan demê dibêje:
Hinde dunya û tu nabî dewletek).

Herwisa Nalbend li çarînek dî, zimanê Kurdî ji şengisteyên hikometê dadine bo Kurdan dibêje:
We hêla betal Kurdiya tol û terr
Bo resim û hikûmet neman ceng û perr
Lew erz û milkê we bû qal û şerr
Pezê xo tu fikirê ku xeyrî we dot (15).
Ev hozanên me ji hinde hozanvanên Kurd vegêrayn, rûberekê berfireh ji nexşeyê hizra dewletbûnê vedigere, ku ji sala 1567 ji cem Cizîrî dest pê

dike, heta sala 1963 ku sala wexirkirina Ehmedê Nalbend e. Anku çar sed salî, bêgomane gelek helbestvanên Kurd yên dî li çerxê bîstê ev bîrok e li cem hebû, lê me bihtir destpêk û berahî û pêşeng wergirtin, da bizanin ku hizra dewleta Kurdî, her ji mêj de li gel rewşenbîrên Kurd hebû û heta niha berdewam e…

Encam.

Piştî xwendin û vekolînê, li zincîra berdewama rewşenbîriya Kurdî, bo me diyar dibe, her ji mêj de rewşenbîrên Kurd hizir di çareseriya vê dozê de kirine, doza Kurdî, û her hingê wan ew çareserî ya di dewleteka Kurdî de dîtine, lewma bi aşkerayî ew babet berçav kiriye û şîrove kiriye, heta gehştîne wî encamî, ev jî gelek rûne di helbestên komeka helbestvanên Kurd yên kilasîk de, ewên bi aşkerayî çareserî di dewletbûnê de dîtî û ew helbet di wî warî de bûne pêngên wê daxwazê, berî çar çerxa û heta niha jî ew daxwaz her roj dihê kirin…

Jêder:

1- dîwana melayê Cizîrî, berhev kirin û vewijartina Tehsîn Îbrahîm Doskî, Dihuk-çapxana Hawar, sala 2000 rû 269.
2- jêderê navbirî rû 269.
3- jêderê navbirî rû 266.
4- jêderê navbirî rû 270.
Her wisa binêre(pirtûka geriyanek di nav baxê edebê Kurdî de)
Ji danana Reşîd Findî, Dihuk 2005. rû 21-24.
5- Mem û Zîn, Hejar Mokiriyanî, Parîs 1989. rû 22.
6- jêderê navbirî, rû 23.
7- jêderê navbirî, rû 21.
8- jêderê navbirî, rû 20 û 26.
9- jêderê navbirî, rû 27.

Her wisa pirtûka ("geriyanek di nav baxê edebê Kurdî de". Jêderê navbirî rû, 54,55 her wisa rû 62,64).
10- dîwana Hecî Qadirê Kuyê, Gêwey mokiriyanî, Hewlêr 1969 rû 19.
11- jêderê navbirî, rû 19.
12- jêderê navbirî, rû 19.
13- jêderê navbirî, rû 45.
14- dîwana Nalbendî , baxê Kurdab, çapaxana Xebat- Dihuk- bergê 3, rû 31-32.
15- jêderê berê bergê 3 rû 14.